

## Serdar Êywez xan, Kurdê Celalî

Li sala 1260`an rojî de serdema paşahî Nasiredîn şahê Qacar dema hukmdarîya Emîr Husêyn Îlxan Zeferanlo Şoca dole Qûçanî û Yarmemed xan Şadlo ,seham dole Bijnûrdî girêbesteke şermsar bi navê Axal hate nivîsîn ku bajarê Fîrozê gundên ......

dom»R:8





*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (477)05-09-2024Buha (1000) Tûmen*



## Şerefkendî, Rêberek bo demên dijvar

Heya niha lêkolînek berfireh ku hemû aliyên jiyana siyasî a dr. Şerefkendî ji xwe bigre, nehatiye kirin û gelek aliyên jîyana wî rêberê jîr û aqilmend her bi veşartî mane û bêhtir nav û navdariya wî di peyvendî ligel bûyera şehîdbûna wî, û dadgeha terorîstên îranî li dadgeha Mîkonosê ve hatiye girêdan û kêmtir bas li rola wî a mezîn û bi bandor li şoreşê de hatiye kirin û ......

dom» R:3



## Li Îran û Kurdistanê binpêkirinên mafên mirovan zêde dibin

Di heyama zêdetir ji çar dehik desthilatdariya rejîma Îslamiya Îranê li ser Îranê û dagîrkirina Rojhilatê Kurdistanê, bi awayekî berdewam û bi şêweyên curbicur ji aliyê vê rejîmê ve mafên mirovan hatiye binpêkirin. Herçend tê gotin ku du baskên desthilatê hene (bingehparêz û reformxwaz), lê bi giştî cewhera vê hêzê yek e û her kesê ku bawer bike ku Cudahî di navbera van her du baskan de heye, bi tevahî şaş e.

dom» R:6

# Şoreş namire!



N. Kerîm Perwîzî

Rojekê li Tehran a paytexta mirinê, keçe kurdeke xerîb kevte ber êrîşa serkotkerên hov. Wan wisa hizir dikirin ku gurzê li destê wan û hêza piştevan, bi qasek bihêz e ku qet kes ji xwe re nevêre nav eniya xwe bikne girê, mêzeyî gurzên wan bike û çavê hemû sitemdîtiyekê li hember wan li nişîv e!

Çend roj piştre, li ser gora "Jîna"ya Şehîd, hate nivîsîn "Jîna Can tu namirî! Navê te dê bibe remz!

Sitema bi ser Jînayê, bi bîrhênerê hemû sitemên li jiyana hemû sitemdîtiyan bû û xerîbî li paytexta koletiyê de nîşanderê wan hemû xerîban bû ku li sedsaleya koloniyalîzmê de bo cudatîdanîn li nav coxrafiyaya belalêdayî bi diyarî aniye. Lewma tevî lehiya kerb û kîna gelan û xelkê sitemdîtî, serî hilda û bi bezgînî hemû berfirehiya deşta bêdadiya kewîrê dagirt.

Serhildana xelkê piştguhxistî li Îranê jêr sitema koletiyê de, serhildaneke demkurt û kerbeke bi nişkê ve nebû da ku bi çavsorkirin û serkuta çekmepoşên cemaranê û qomê bê temirandin, belku serhildana hundirê bêdadîdîtiyan bû ku çendîn dehikan e sitem bi wan tê kirin û sivikatî bi kerameta wan tê kirin û her carê xapînerek jî peyda dibe ku seha guherxwaziya wan mifaha xirabî werdigre û piştre bi pêkenîneke tal, diçe ber kêlega sitemkaran.

Êdî volkana kerb û kîna pîroz a jinan û ciwanan, kedkar û kolberan û şewatberan, Kurd û Turkemen û Gîlek û Belûçan û xwendekar û mamosta û manlişînkirî û pere-




star û nexweşê bê derman, hemû bi hev re teqiya û pevre hatine der ku şeqam xwediyê xwe yê rastî bibîne.

Dengê şoreşa "Jin Jiyan Azadî"yê, gihîşte hemû kunceke cîhanê û xelkê dunyayê û tevahiya rastiyên tal ên li nav cîvaka çendîn neteweyî û curbicur a Îranê dîtin.

Lê mixabin hizra ticarî û qazancxwaziya dewletan digel rêjîma ser heta pê ya neftawî û çewtekar û maka terorîzmê, ji hev neqetiyan û lewma rêjîma wilayeta feqîh dirafê hewce bo dabînkirina malî ya hêzên serkutker bi dest xwe ve tîne.

Rijandin aeşkere ya xwîn û tawankariyên li Belûçistan, Kurdistan, Luristan û ...hd, her çi qas ku dengê şoreşa Jînayê kêm kir, lê şoreşek ku ji hundirê gelan de dikele û li dijî înkarkirin û sitemkariya navendê, serî hildaye, tenê ji qonaxa yekem re derbas bûye û li rabûna serpêyan de, dê perdê li ser koletiyê hilde û diçe pêş heta ku paytexta sêdarê bêxe jêr destê xwe û bike bi neynûkek bo jiyana vekhev a hemû netewên li coxrafiyaya sitemkariyê. Şoreş zindî ye û bi nefeskêşaneke kûr û lezgîn, dixwaze ji nû ve serî hilde.



## Welatparêzî Erkekî Esasî Yê Her Kurdekî Netewperwer e!

dom» R:5



## Şoreşa Jîna - Jin, Jiyan, Azadî - Ew dengên nehatin bihîstin!

dom» R:4

# Xermanana pir xem



**N. Nûredîn Sofîzade**



Herçiqas meha Xermananê bo me xelkê Rojhiltê Kurdistanê û xebatkar û şorişvanên wê para Kurdistanê hilgirê gelek rojên tal û buyer û xisarên mezine ku yêk ji wan rojan 26ê Xermananê roja şehîdbûna rêberê jêhatiye me Dr. Sadiq Şerefkendê û hevalên wiye, roja 17`ê Xermananê jî bo gelê Kurd rojeke xembar e ku dibe li dîroka şoreş û berxwedanê de bê tomarkirin heta ku nifş li pey nifşên wê gelê me ji hovîtiya rêjîma hov û cinayetkar a komara îslamî bizanin û agehdar bin ku rêjîma dije mirov bi êrîşa mûşekî bo ser binke û barigehên Hizba Dêmokrat pare cehd kir ku tiresê bêxe nava dilê şoreşvan û azadîxwazan de.

Herçiqas bi sedema wê êrîşê Hizba Dêmokrat û şorişê nirx û xwînekî mezin da, lê rêjîm bi tu avayekê negeheşte xwesta dilê xwe û encamekî berewajî derkevt û li henber îradeya şorişvanan û helwêsta yêkrêz û yêkgire gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, hem bo hevxemiya wê xwîna ku li ber cestê Hizba Dêmokrat herkî, û hem jî bo piştewaniya ji Hizba Dêmokrat û tujmin tê bigehînin ku hemî takekî welatparêze Rojhilatê Kurdistanê yar û pişt û endamekî Hizba Dêmokrate, rêjîm û rêberên wê yên terrorist rastî şikest û windahiyekî mezin kirin.

Demjimêr 11 û çarêkekî ser sibêdehiya roja 17ê Xermanan a sala 1397`, rêjîma tirorîst bi avêtina mûşekên Balêstîk meqer û navend û barigeha Hizba Dêmokrat û kempa cihê akincîbûna jin û zarokên sivîl, kire armanca êrîşa xwe a mûşekî.

Mixabin dîroka Kurdistanê, roja 17ê Xermananê di nava rûpelên xwe de tomar kir. Cihê kombûna parek ji endamên rêberiya Hizbê bû armanca mûşekan û çendîn Endamên rêberî û kadr û pêşmerge şehîd bûn û herwisa binkê Fêrgeha pêgehandina Pêşmerge bû armanc û live jî 2 mamostayên Fêrgê şehîd bûn û çendîn kes jî birîndar bûn.

Şehîdên vê carê yên Kurdistanê jî weke yên berî xwe cane xwe goriyê armancên bilinde gelê xwe kirin û heçî dilopek ji xwîna wan bû girkan û agirekî bigur bi dijî rêjîma cinayetkar peqiya.

Şehîdên 17ê Xermananê bûne remza yêkdengî û yêkîtiya netewî. Rêjîma Îranê dixwast bi lêdana barigeha Hizbê û havêtina mûşek û çekên herî giran hem şorişvanê Rojhilat bitirsîne û wan bêdeng bike û ji xebatê sist bike, hem dixwast nîgeranî û di encamê de bê hivitiyê bêxe nava xelkê Rojhilatê Kurdistanê ku piştevanê hertimiye Hizba Dêmokrat bûne.

Lê herwekî pêşde hate gotin, rêjîm negeheşte xweziya xwe, belku serê wê li kevrê hişke kurdistanê kevt û tûşî şikestê bû, û hemî cîhan haylê bû ku ev rêjîma çiqas ji Hizba Dêmokrat û şorişvanê Kurd ditirse. Piştî wê êrîşa hovane û tirsnokane,roja 21`ê Xermananê anku 4 rojan piştî êrîşa dirindane ya rêjîmê, eva Kurdistan bû ku bi bêdengî rabû ser pêyan, û li beşeke mat a Kurdistanê, kîna dagîrker kir bin axê de, heta ku bêjine wan, "Ne"gotina me herçend bi bêdengî ye, lê di nav hundirê me de ye û 4 dehik cinayet û xiyanetê nekariye netewa Kurd teslîm bike.

Her di wê rojê de rejîma tawanbar û cinayetkar ku wekî gurê har lê hatibû, dest avête îdamkirina çend ciwanên Kurd. 17`ê Xermananê bîranîna çend xalan hewce ye, ku bi wî awayî ne:

**1**-Rejîm bo xwe vedizîn ji krîzên ku ser hev de bibûne kelek, hewil dida li derveyî sînorê cugrafiyaya xwe, şer û fitneyeke nû biafirêne.

**2**-Çavtirsandina xelkê navxwe û yên deverê.

**3**-Rejîm Kurdan bi bizwêner û rêkxerê guherînkariyên paşeroja Îranê dizane, û dixwaze piştî vê ku pirsgirêk, hikûmetê bi giştî bêxin metirsiyê de, netewa Kurd û hêzên Kurd lawaz bike.

**4**-Pêşbîniya rejîmê derheqê bêdengiya welatên derekî û kom û komleyên bi berçav parêzvanên mafê mirovan derheq vê cinayetê, mixabin heya niha pêşbîniyeke şaş nebûye.

**5**-Bikaranîna mûşekê li dijî Hizba Demokrat, vê yekê dide zanîn ku rejîm li hember xebat û pêgeha Hizbê li nava xelkê Rojhilat de damayî û bê şiyane.
6-Roj li pey rojê, şerên deverê ku rejîmê roleke nerênî têde lîstiye kûrtir dibe, û rejîmê bo dilxweşkirina kirêgirtî û hêzên girêdayê xwe hewcehî bi manovrekî wiha hebû.

Her çawa hate baskirin tenê çar roj piştî cinayeta rejîmê, Kurdistan yekdeng rabû ser pêyan, û bi bêdengiyeke watedar û mangirtina giştî li seranserî Rojhilatê Kurdistanê, cinayetên rejîmê şermezar kir û îradeya polayîne berxwedaniya xwe nîşanî her kesî da.

Lewma di dawiyê de hewce ye em hemû vê yekê bizanin ku di 21`ê Xermananê de, beşeke zêde ew hêvî û xeyal û xevnên rejîmê bûne bilqên ser avê, û rejîm di Rojhilatê Kurdistanê de şikesteke bê mînak xwar.


Xelkê Kurdistanê bi daxistina dikan û bazarên bajar, ber bi banghêjiya Partiyên Rojhilatê ve hatin, û bi rohnî dengên xwe bi diruşma "Na bo îdam" û "na bo mûşekbaran" û "na bo binpêkarî" û "na bo komara Îslamî" li dijî rejîmê bilind kirin û carekî din nîşan dan ku rejîm xwediyê ti pêgeh û rewatiyeke di nava xelkê di Kurdistanê de nebûye û nîne.



# Şerefkendî, Rêberek bo demên dijvar



N. Elî Munezemî




Heya niha lêkolînek berfireh ku hemû aliyên jiyana siyasî a dr. Şerefkendî ji xwe bigre, nehatiye kirin û gelek aliyên jîyana wî rêberê jîr û aqilmend her bi veşartî mane û bêhtir nav û navdariya wî di peyvendî ligel bûyera şehîdbûna wî, û dadgeha terorîstên îranî li dadgeha Mîkonosê ve hatiye girêdan û kêmtir bas li rola wî a mezîn û bi bandor li şoreşê de hatiye kirin û ew yek jî kêmasiyek mezin e bo nivîskar, şirovekar, rewşenbîr û lêkolînerên kurd û bizava rizgarîxwazî a Kurdistanê.

Li ber hindê ew kurtegotara hatiye nivîsîn ku balê bikîşîne ser wan aliyên weşartî yên jiyana wî rêberê navdar û nivîskarên kurd teşwîq bike ku li vî aliyê jiyana dewlemend a Şerefkendî binêrin.

**Şerefkendî di serdema xebata xwe ya şoreşgerî de zaf caran bi zanatiya xwe, bizava rizgarîxwaziya kurdan di Rojhilatê Kurdistanê de li tehdîd û gefên dijmin û xayinan parast.**

Tê gotin ku gava paşmayiyên grûpa xayîn a 7 kesî bi xayinitî û piştgiriya dijmin û berevankarên dijmin dixwestin li Bakûrê Rojhilatê zerbeyên mezin li pêşmergeyên PDKÎê bidin û wan herêman li dest şoreşgeran derxînin û teslîmê destê dagîrkerên Îranê bikin, dr. Şerefkendî ku bi pîlanên wan û bi nav gotûbêj tevî karbidestên rejîma terorîstî tevî PDKÎê hatibû wê herêmê, lê ewan pîlana kuştina Şerefkendî û têkdana şoreşê di wê herêmê de hebû, Şerefkendî karî bi mudîriyet, jîrîtî û desthilatdariya xwe wan pîlanan li valahiyê derxîne û li alîyekê şoreşê biparêze û li hêla din jî wan xayînan li refên şoreşê pakij bike û ewan hind tengav bike ku ew havara xwe bo xwefiroş û erbabên xwe yên dagîrkar bibin.

Şerefkendî di heman demê de bo zelalkirina rêya rast a xebat û berxwedanê, bi cesûrî xwe dike mertalê parastina axa Kurdistanê û parastina hêza pêşmerge û carek din hem şûnpêyên hizba demokrat li herêmê de qahîm dike û hem jî bi dijmin dide selimandin ku ew hind xwedî zanist û tecrubeyên rêberiyê ye ku dikare li demên herî dijvar de biryarên rast û bihêz bide û tama tal a şikestê bi dijmin bide tamkirin.



**Şerefkendî di jiyana xwe a siyasî de zaf caran ew aliyên jêhatî yên kesayetiya xwe di meydana piratîkê de xistin ber çavên dost û neyaran.**

Ew her tim li hêlên neteweperwerî û welathezî a partiyê xwedî derket û qet mecal û derfet neda ku kes bikaribe wê partiyê li siyaseta wê a realîstane û rast bi rêya şaş de bibe.

**Şerefkendî piştî şehîdbûna dr. Qasimlo jî ew karakterên kesayetiya xwe bi berfirehî û rengîntir da eyankirin. Ewî karî ku nehêle piştî şehîdbûna Qasimlo, netewe, pêşmerge, dost û alîgirên hizba demokrat bê hêvî bimînin.**

Ew hem wan re bû cihê hêviyê û hem jî ew fêr kirin ku tehemula hemû birînek kûr û bi êş û jan bikin û çi dibe bila bibe, lê hêviya xwe winda nekin.

Ew tovê hêvîyê bû ku Şerefkendî di hizr û dilê neteweya xwe da çand.

Li ber ku Şerefkendî karî ders û şîretên Qasimlo bîne bîra neteweya xwe û digot ku «eger em hemû ders û şîretên Qasimlo li yek desrê de kurt bikin, ew ders ewaye ku ewî bala me kişande ser hêz û şiyana me û em têgihîştandin ku eger me baverî bi xwe hebe û pişta hev bigrin, em xwediyê hind hêzeke xurt in ku dijmin dihejîne û tûşê vepirpitîna ber mirinê dike.»

Ewî û dr. Qasimlo em fêr kirin ku li ser piyê xwe bisekinin û şehîdbûna wan me hind xembar neke ku em nekarin dirêjiyê bidne şoreşê.

Ewan xwest ku di nemana wan de jî em alaya xebata wan bilind rabigrin û li heman demê de ku em wan û hemû şehîdan bi rêzdarî bi bîr bînin, lê her wisa cehdê bikin ku armancên wan bikin rastî û realîze bikin.

Ez baver im ku nifşa niha ku hem nifşek jîr û hem xwediyê hest û xîretek bilind e, yê Şerefkendî xwe re bikin sembola berxwedanê û bi têgihîştin li kesayetî û jiyana Şerefkendî, yê faşîst û dagîrkeran li Kurdistanê bavêjin derve û bi serketina şoreşê, ruhê Şerefkendî û hemû şehîdan şad bikin. Ew roj ne gelek dûr e.

# Şoreşa Jîna - Jin, Jiyan, Azadî - Ew dengên nehatin bihîstin!




N. Dr. Mecîd Heqî



Di dema binaxkirina Jîna yê di 17ê Îlona 2022 'an de, pêleke dirûşmeyên "Jin, Jiyan, Azadî" dest pê kir ku bi lezeke ecêb li seranserê Rojhilatê Kurdistanê û tevahiya Îranê belav bû. Pêla Şoreşa Jîna – Jin, Jiyan, Azadî sînorên erdnîgarî derbas kir. Dengê mafxwaziya Kurdistanê li Tehranê hat bihîstin, Belûçistan bû hevalbend û Azerbaycan bi Kurdistanê re sempatî kir.

Tirsa ciwanan li seranserê Îranê li hember polîs, geşta Îrşad, Besîc û hemû dezgehên tepeserker ên rejîmê têk çû û rejîma Îranê ber bi hilweşînê ve çû.

Tişta ku di şoreşa Jîna yê de qewimî, ne tenê ji ber "hişmendiya şoreşgerî" a gelên Îranê bû, belkî pêleke hest û hêrsa li hember tepeserkirina sîstematîk a xelkê ji aliyê Komara Îslamî ya Îranê ve bû. Berevajî serhildanên berê yên piştî hatina ser kar a Komara Îslamî li Îranê de, ne herêmî û aborî bû, û ne wek bizava Kesk (Conbeşê sebz) bû ji bo şerê di navbera fîraksyonên rejîma Iranê de. Ew serhildanek bû ji bo guherandina dîmena zilm û çewsandinê.



Çi çewisandina milî ya ji aliyê desthilatdariya navendî û mejiyê dagirkeriyê ve, çi zilma mirovî ya li ser destê mirovan be, çi jî sîstema baviksalarî û mêranî be. Jin Jiyan, Azadî, bi gotinên Shakespeare, li ser tevahiya rabirdûya zilmê reflekseke bi hêrs bû.

Hest bi gelemperî ji hişmendiyê kêmtir têne dîtin, lê şoreşa Jînayê îspat kir ku, bi rêvebirinek jîr re, hest dikarin bi armanc bêne rêkûpêk kirin. Dema ku sedema hestan pirsgirêkek bêçare ye. Pirsgirêkên ku rê li ber jiyana normal ya mirovan vedigirin, dema ku em diêşin, dema ku em ditirsin, gava ku em hêrs dibin an jî dema ku tiştek mîna pencеşêrê ruh û laşê miletekî berî ku em "hiş" bibin dişewitînin; Êşên ku em bi goşt û xwîna xwe hîs dikin, dibin çavkaniya çalakiyê. Kêl bi kêlî, van hestan di nav agir de çêdibin û forma hişmendiyê digirin da ku pirsgirêkek çareser bikin û birînan derman bikin.

Şoreşa Jîna sînorên hizbî û rêxistinî şikand, bû sedem ku nifşekî nû bikeve qada têkoşînê û erdnîgariya siyasî û rêxistinî ya Kurdistanê ber bi guherîneke mayînde ve biçe. Partiyên Kurdistanî nekarîn xwe bi guherînê re biguncînin û naverok û kûrahiya şoreşê jî nebûye bingehê guhertina hizra siyasî û rêxistinî ya tevgera siyasî ya Kurdistanê.

Şoreşa Jîna li hemberî hemû kevneşopiyên kevin ên civakî, siyasî û rêxistinî bû asteng û mijara "serkêşiya jinan" ji hêlekê ve bû navenda nîqaşê. Dînamîkên tevgera Jînayê ne hişmendî belkî hesta hevpar bû. Hişmendî tiştekî ku ji jor ber bi jêr ve ji rewşenbîr û elîta rewşenbîran tê civakê. Hestên gel bû ku rewşenbîr û elîta siyasî li ber xwe da û hestên gel bû ku forma madî girt û pêlan çêkir.

Hestek ku ji dilê mirovekî ber bi yê din ve, ji çavekî ber bi çavekî din û ji laşekî ber bi yê din ve diherike. Dema ku dê û bav sirûdên şoreşgerî li ser gorên zarokên xwe digotin, dema dê û bavên şehîdan li şûna ku li ser gora hezkiriyên xwe sirûdên şoreşgerî li ber xwe bidin, pîrozbahî li girtiyên xwe dikirin, ev hest bûn ku bûn agirê şoreşê ku bû sedema xwenaskirinê. guhertina bingehîn.

Şoreşa Jîna – jin, jiyan, azadî divê bi perspektîfa siyaseta berhevkewtinan were dîtin. Ji bo vê armancê, li gorî Andy Merrifield (1960) di The Politics of the Encounter de, ev şoreş mîna dilopên baranê yên paralel bûn. Dilopên baranê ji ewran paralel dimeşin heta ku dilopek tenê carekê di xetên paralel de derdikevbe û bi dilopek din diqelibe. Tiştek nû, nîzamek nû ku prensîbên wê têkoşîna kolektîf e dixuliqe. Tevgera Jîna têkiliya dilopên di nava dilopên paralel de bû.

Tevgera Jîna bû sedem ku di siyaset û siyasetê de dîmenek nû derkeve holê. Civaka navneteweyî dengê xelkê Îranê bihîst. Rêxistina Neteweyên Yekbûyî dest bi avakirina komîteyeke lêkolînkirina tawanên rejîma Îranê kir. Tiştekî ku bû sedem ku partî û gelek serkirdeyên partiyên siyasî hem li ser asta partiyên navendî yên Îranê û hem jî li ser asta partiyên Kurdistanî yên Rojhilatê Kurdistanê bilezînin; Ji "korbûna lez"ê diêşin û diherikin desthilatdariyê. Encam peymana George town bû, Peymanek ku bû destpêka pêla hêzên neyînî di nav şoreşê de bû. Şoreşeke ku dikaribû bibe hêza guhertinê û Kurdistan ji marjînalê veguherand navenda rêbertiya tevgera dadperwer û mafxwaz a gelên bindest ên Îranê, bû qurbaniya otorîterîz xwaziyek lez û bez. Kurdistana yekbûyî gav bi gav ji hev belav bû.

Piştî du salan ji şoreşa Jîna û piştî bûyerên 13'ê Nîsana 2024'an, niha cîhan ji her demê zêdetir naveroka rejîma Îranê dizane û bi cesaret dikarim bêjim ku di qada navnetewî de ti carî derfetek wiha ji bo tevgera Rojhilatê Kurdistanê nehatiye dîtin.

Lê ji ber parçebûneke ku mixabin dawiya wê nîne, her roj derfet ji dest diçin; Dema ku qada torên civakî di sedsala îstîxbarata çêkirî de divê bibe qada sereke ya têkoşîna li dijî dagirkeriyê û ji bo berjewendiyên bilind ên neteweyî, ev qad bûye qada çareserkirina pirsgirêkên rêxistinî, takekesî û siyasî yên di nava mala Kurdan de.

Ger aliyên siyasî dengê şoreşê weke xwe nebihîzin, qîrîna nifşê Z û Alfa nebihîzin û jin, ciwan û nifşê nû nekin rola sereke, derfeteke zêrîn di metirsiya windakirinê de ye. ji biryarên siyasî Ew nikarin bi zimanê sedsala îstîxbarata çêkirî biaxivin.

# Welatparêzî Erkekî Esasî Yê Her Kurdekî Netewperwere!



N. Cano Amedî

Welatparêzî, li xwe û li doza xwe xwedî derketine û ev helwest jî erkê her kurdekî netewperwer e. Ev erk bingeha xwe ji hestên mirovahîyê û xwezayê jî digre. Hebûn û tunebûna netewan bi desthilatdarîya ernîgarîyê ve girêdayî ye. Miletên ku ji bo mafên xwe têdikoşin, hebûna xwe radestî dîrokê dikin. Lê belê, sitûxwarî û koletî bi xwe re mirina zîndî derdixe holê.
Sîyaseta mêtîngehkarî, bişavtin û entegrasyon, bingeha tunebûna milletan geş dike. Welatparêzî, li hemberê sîyaseta tunekirinê, wargeha berxwedan û têkoşîna desthilatdarîya miletê xwe ye!

Bicîhanîna erkê netewî, kar û xebatên ji bo berjewendîyên giştî, têkoşîna li dijî dagirker û zaliman, bi temenê beşekî civatê ve ne girêdayî ye.
Temen û mensubîyeta çînî ya civakî, çi dibe bila bibe; divê her kurdekî/e niştimanperwer erkên xwe yên welatparêzîyê bi cîh bîne. Ev erk jî têkoşîna bidestxistina mafên ji milletbûnê tê bi xwe ye. Hemû beşên civatê, di warê têkoşîna bo azadîya kurdistanê de deyndar e û divê tu kes wî deynê xwe nesipêre kesekî din an beşekî din!

Temenê me, ne asteng e ku em li dijî dagirkerîyê, li dijî sîyaseta mêtîngehkarîyê ne xwedî vizyon û helwestekê bin. Lewra helwest nîşandayin, bi hişmendîya netewî û karakterê hemwelatîyê ve girêdayî ye. Ji ber van sedeman, temen ne astenge ji bo kar û xebatên doza netewî. Ked û xebatên kesayetan, hewldan û têkoşîna girseyî, weke dilopên baranê, rê li ber çem û robaran geş dike.

Her mirov, her niştimanperwer li gorî taqet û hêza xwe, li gorî şert û mercên xwe, li gorî enerjî û derfetên xwe, dikare dilopên xweydana xwe, ked û enerjîya xwe bi pêlên têkoşîna netewî re parve bike. Bêguman helwest girtin û beşdarbûna nav refên têkoşînê li gorî pîvanên bîr û bawerîya kesayetîyê diguhere. Car caran pêlên bayê desthilatdar rê li ber demsalên berjewendîyên demkî vedike, bahoz û alozîyên civatî tevna civatê serûbin dike. Hişmendîya netewî, dibe dîlê berjewendîya rojane.

Sîyaseta welatparêzî, bi hişmendîya netewî, bi kelecanîya têkoşînê, bi hest û pêwîstîya rêxistinbûnê, bi pênûs û nêrînên xwe dikare wezîfeyên xwe yên millî bi cih bîne; bi ked û xebatên hevbeş dikare bibe şirîkê doza bargiran. Ev erk ji bo herkesî derbas dibe. Nûner û temsîlkarên civatê neçarin ku erkê xwe yên netewî bi cîh bînin. Konjonktura dunyayê, demsalên sîyasî, sosyolojîya civatê, şert û mercên demê, pêvajoya qeyranên sîyasî û aborî, ji bo veguherînek sîyasî, rêxistinî, civakî û kurdî pir girîng e! Hewldan û xebatên bi vî rengî, li gorî xwendin û nûjenkirina pêvajoya demê û li gorî têgihiştin û encamgirtina wê xwendinê ye.

Hewce nake ku em ji nû ve rabin, cardin “Emerîkayê keşif bikin”. Tecrube û zehmetîyên ku me kişandîne em bigirin ber çavan û di dibîstana dîrokê de, bala xwe bidin tecrubeyên polên têkoşînê û li xwe vegerin, bawer bikin emê bi hêsanî bikaribin barê xwe sivik bikin. Lê mixabin nexweşîyên “ez û eztîyê”, gerînoka “egoyê” û hesabên berjewendîyên şexsî, rê li ber me dixetimîne, asê dike û me difetisîne!

Di pêvajoyên hewldanên lêgerînê de, divê dêrûnî û encamên demsalên şikestinê baş bê nîrxandin, baş bê şîrove kirin û li ser encamên rasteqîn bê rawestin. Herkes dikare li gorî şert û mercên dema xortanîya xwe, li gorî enerjîya cîwanîya xwe pêvajoya îro binîrxîne. Şertên do û îro mûqayese bike! Çawa û bi çi şêweyî beşdarî nav refên têkoşînê bû.

Ev beşdarbûn bi biryara malbatî bû an bi biryara kesayetî bû? Biryarên bi serê xwe bûn an biryarên bi bandora derdorê bûn? Bersiva van pirsan di turîkê herkesî de heye û bersîv ji hev cuda ne! Berîya em pirsên “Çima, Çima, Çima?” li pey hev rêz bikin, divê em derbasbûna xwe, xortanî û pêvajoya “betlana sîyasî” baş binîrxînin. Bersîva destpêka pirsa “ÇİMA” di wan gêrînokan de veşartîye.
Helwest girtin an beşdarbûna nav refên têkoşînê, do, îro û sibê jî li gorî şert û mercên demê ye. Pêwîstîyên civatê, rêxistinbûna civatê û hêzbûna civatê, rê li ber ba û bahozên guhertinê xweş dike. Problem ew e ku em bikaribin wî bayî geş bikin û bala civatê bikşînin ser wan hewldanan.

Lê mixabin û hezar carî mixabin, hinek kesayetên ku sî-çil sal in ji rastîya civata xwe dûr ketine, ji rastîya jiyana rojane û zehmetîyên demê dûr ketine, di bin tesîra nakokîyên dêrûnî de xwe diêşînin. Pirî caran mêzîna edaletê û ûjdanê li gorî hestên xwe binpê dikin. Pirî caran bi xwe re û bi derdora xwe re ne li hevkirî ne, sebeb û sedemên wê psîkolojîyê jî disa salên derbasbûyî û encamên şikestina sîyasî û rêxistinî ye. Ji ber ku muhasebe û lêkolînek rasteqîn nehat kirin, “hesab xwestin û hesabdayîn” di kolanan de, bû benîştê devên gotgotan.

Rast e, em hemû di pêvajoyên dijwar re derbas bûn û dibin. Zahmetî û pirsgirêkên welatê me têra xwe pir û dijwar in. Bandora wan pirsgirêkan li ser jiyana me gelek tesîr dike. Hêz û qeweta me, rêxistinbûn û hişmendîya me ya civakî, li ber pêlên zilmê lawaz dimîne. Heta ku em bi hişmendîyeke netewî tevnegerin, bi armanc û stratejîyeke netewî, bi hêz û sînerjîyeke milî li hemberî sîstema dagirkerîyê qeweta xwe di bin sîwanek netewî de nêzî hev nekin, bi hevre tevnegerin û bi hevre bersîva pêvajoyê nedin, bawer bikin emê yek bi yek, hêz bi hêz, di gêrînoka “ez û eztîyê de” bifetisin. Divê em xwe û derdora xwe ji hestên dorpeçkirî û birîndarkirî xilas bikin. Pêwîstîya me bi hev heye, divê em hevdû gohdar bikin, bi hestên empatîyê em şans bidin hev û rê li ber hev asê nekin. Xurandina birînan hêsan e, lê tedawî û ji bîrkirina êşa birînên müşterek gelekî zehmet e!

Nêrînên me, helwestên me, partî û rêxistinên me ji hev cuda ne; lê welatê me, hestên me, hişmendî û êşên me yên netewî ji yek çavkanîyê ne. Em bixwazin an nexwazin, êş û birînên me yek in. Teşhîs û tedawîya me jî li gorî wê têgihiştinê bi hevre girêdayî ye. Hewce nake em di kolanên taxa medyaya civakî de, bi helwestên hestyarî, bi refleksên dijberî, bi çîrokên “virtî-vala” canê hewdû biêşînin.

Divê herkes li gorî şert û mercên xwe, li gorî qewet û zanyarîya xwe bibe paleyê çêkirinê, bibe têkoşerê fedakarîyê. Divê em kêmasî û şaşîyên xwe qebûl bikin; goh bidin rexne û gazindeyên çêker. Em weke hev nefikirin jî divê li ser bingeha berjewendîyên netewî, em rêz li dîtin û helwestên hev bigirin.

Têkoşîna rizgarîya netewî bi ked û xebatên hemû beşên civatê bi ser dikeve. Divê her kurdistanîyekî ku doza netewî ji xwe re kiriye armanc, bi berpirsîyarîya welatparêzîyê tevbigere û erkê xwe bi cîh bîne. Silav û rêz ji bo xwendin û nîrxandina we...



# Li Îran û Kurdistanê binpêkirinên mafên mirovan zêde dibin



**N. Bêhzad Qadirî**
**W. Hesen Mukerem**






Di heyama zêdetir ji çar dehik desthilatdariya rejîma Îslamiya Îranê li ser Îranê û dagîrkirina Rojhilatê Kurdistanê, bi awayekî berdewam û bi şêweyên curbicur ji aliyê vê rejîmê ve mafên mirovan hatiye binpêkirin.

Herçend tê gotin ku du baskên desthilatê hene (bingehparêz û reformxwaz), lê bi giştî cewhera vê hêzê yek e û her kesê ku bawer bike ku Cudahî di navbera van her du baskan de heye, bi tevahî şaş e.

Wek mînak Mesûd Pijşkiyan wek serkomarê rejîmê hat destnîşankirin (ji ber ku li Îranê hilbijartin tune û her tişt şanoya desthilatdariyê ye) û reformxwazan piştgirî dan wî, lê berevajî îdiayên wan, binpêkirina mafên mirovan li Îranê kêm nebûne, lê zêde bûne.

Mesûd Pizşkiyan zêdeyî mehekê ye ku wek serkomarê rejîmê hatiye destnîşankirin dibêje: "Hin kes difikirin ku divê ez tiştekî bikim, ez nikarim tiştekî bikim... Min sozên taybet nedane.

**Ev bi xwe jî îsbat dike ku serkomar bi rastî bêhêz e û navenda sereke ya biryardayînê li Îranê Meclîsa Şêwra Nûbedaran e. Ev jî îsbat dike ku bi hatin û çûna srkomaran (çi bingehîn û çi reformxwaz) tiştek naguhere.**



Li Îranê di mehekê de herî kêm 94 girtî hatin îdamkirin.

Li gorî rapora Rêxistina Mafê Mirovan a Hengawê, di heyama mehekê de herî kêm 94 girtî di girtîgehên Îranê de hatine îdamkirin. Ev hejmar jî li gorî meha Pûşperê ku 55 girtî hatin îdamkirin 39 halet, ango ji sedî 71 zêde bûye (ango berovajî îdiayên reformxwazan, îdam zêde bûne).

Ji sedî 21ê girtiyên ku di vê mehê de hatine îdamkirin welatiyên Kurd in.

Di meha Tebaxê de, herî kêm 28 welatiyên Rojhilatê Kurdistanê ku 8 ji wan welatiyên Loristanê bûn, ji aliyê rejîma Îranê ve di girtîgehên Îranê de hatin îdamkirin, ku di nav wan de girtiyê siyasî yê Kurd yê Yarsan Riza Resayî ku di dema şoreşa Jînayê de hatibû girtin, roja 16ê Pûşperê li girtîgeha Dêzilava ya li Kirmaşanê , hat îdamkirin..

Di mehekê de 15 kolber hatin kuştin û birîndarkirin Li gorî rapora Hengaw, di Tebaxa 2024'an de herî kêm 15 kolber li sînorên destkird yên Kurdistanê hatine kuştin û birîndarkirin ku ji sedî 86.5 ji wan bi guleyên rasterast ên hêzên leşkerî ên Îranê bûye.

Li gor vê raporê 4 kolber hatine kuştin û 11 kes jî birîndar bûne.
"
Esed Efrence xelkê Merîwanê, Nasir Osmanî xelk Rebetê, Elî Resûlî xelkê Mehabadê û Esed Êspandar xelkê Serdeştê ew 4 kolberin ku meha borî ji aliyê hêzên leşkerî ên Îranê ve hatin kuştin an jî ji bilindahiyan ketine.

Hejmara herî zêde ya qurbaniyan li parêzgeha Sine bi 13 bûyeran hatiye tomarkirin.

**Divê ez vê yekê jî bidim zanîn ku kolberî ne karekî asayî û ne jî karekî mirovî ye, lê berhema dagîrkirina rejîma Tehranê li Kurdistanê ye.**

Givaşên li ser mamosteyên olî yên kurd.

Em hertim bûne şahidê givaşên dezgehên îtla`at û leşkerî yên rejîma Îslamî ya Îranê li ser gelê Kurd, çalakvanên sivîl û jîngehparêz û mamostayên olî yên welatparêz.

Wek mînak, Sabir Xwedamuradî, mamosteyê olî yê taxa Qewaxî ya bajarê Seqizê, berî demekê ji aliyê dadgeha taybet a Rûhaniyetê ya bajarê Hemedanê ve, bi 15 meh girtîgeh hat cezakirin.

Hevdem, roja Yekşemî 4`ê Xermananê, Elî Behramî pêşnimêjê gundê Nêy ya ser bi bajarê Merîwanê, ji aliyê hêzên îtila`ata rejîmê ve hat girtin û piştî nêzîkî heft demjimêran ji lêpirsînê hat berdan, lê telefona destê wî dest bi ser de hat girtin.

Givaşên li ser çalakvanên sivîl û jîngehparêz ên Kurd Weke ku min behs kir, givaşên li ser xelkê bi taybet çalakvanên sivîl û jîngehparêzî ne tenê kêm nebûne, belkû zêde bûne. Wek mînak çarenivîsa 8 çalakvanên jîngehparêz ên Gîlanê hîn ne diyar e û Spaha Pasdaran a terorîst dixwazin dozên sexte li dijî wan derxînin.

Ew 8 kesên bi navên Mariya Xanî, Muhsin Êsfendyarî, Aras Ulfatî, Cehangîr Azadî, Lutfullah Perwîz, Hemîdriza Rehîmiyan, Selman Perhan û Mihemed Perwîz çalakvanên sivîl û jîngehparêz ên ji Gîlanê ne ku di dawiya Pûşperê de ji aliyê hêzên îtla`ata Spaha Pasdaran ve hatibûn girtin.

**Dawî**

Binpêkirina mafên mirovan di vê mehê de ji aliyê rejîma Îslamî ya Îranê ve tenê bi van xalan re sînordar nîne.

Wek mînak bi dehan welatiyên Kurd hatine girtin, sizayên girtîgehê û qamçiyan bi ser van de hatine sepandi û dozên sexte li ser dehan kesên din hatine vekirin.

Her wiha bi dehan welatiyên Kurd ji ber îtirafên bi zorê di girtîgehên rejîmê de rastî îşkenceyê tên.
Divê em vê yekê jî bizanibin ku heta ev rejîm li ser desthilatdariyê be dê ev pêvajoyê berdewam bike.

## Nerîna



**“Donald Trump”:**

**“Rayedarên Ukraynayê hejmara rast a kuştî û birîndarên operasyona leşkerî ya taybet a Rûsyayê vedişêrin”**



**“Vladimir Putin”:**

**“ Êrîşa Ukraynayê ya li ser Kurskê dê me nerawestîn e”**



**“ Sergey Lavrov” :**

**“ Amerîkayê şiya Kurdên Sûriyeyê bikişîne nav lîstikên xwe lê armanca wî welatî tenê petrol û gaz in, ne Kurd”**



**“Mitch McConnell”:**

**“Derzkirin û bandora tunjdûtîj a rêjîma Îslamiya Îranê li Rojhilata Navîn de bi şêrpence ye”**

# Êdî rêjîma Îranê şikefta Seholan li Mehabadê tam piştguh xistiye



**N. Eskender Ceiferî**



Şikefta Seholanê dikeve 35 kîlometriya riya di navbera Mehabad-Bokanê de.Mixabin di salên derbasbûyî de rêjîma dagirkar a faşîstên Tehranê wek pêwîst guh nedaye vê şikeftê. Di 5 salên dawiyê de jî piştî hatina Corona, ev şikeft ji lîsta cihên torîstî yên Îranê hatiye derxitsin.

Her hemû torîst û serdanker jî, eger bi dehan caran serdana Seholanê bikin dîsa jî têr nabin. Matmayî dibin û li derdoran dinêrin. Her sal hezaran kes serdana wê şikeftê dikin.Seholan bi Soranî tê wateya bûzê. Dîwarên wê tev ji kevirên mîna bûzê ne.

Erdê şikefta Seholan ji gelek kaniyên biçûk û mezin pêk hatiye. Dalan û riyên biçûk û mezin jî di dîwarên şikeftê de hene ku ger bi belemê bikarî derbas bibî yan jî bi avjeniyê, hemû digêjine hev.

Kaniya herî dawiyê, bi qasî 50 metran serê xwe daye bin banê şikeftê. Kûrahiya avê di kaniya navîn de digihêje 35 metran. 46 salan beriya niha şandeyeke zanîngeha Aksfordê serdana Seholanê kir û ragihandin ku ew şikeft, ji bêmînaktirîn şikeftên cîhanê ye. Wan di raoorekê de di vê derbarê de matmayîna xwe anîbûn ziman.

Sala 1990’an jî hejmareke lokîneran ji bo naskirina zêdetir, serdana Seholana Mehabadê kirin. Wan karîn derî û riyên nû di nav şikeftê de bibînim. Vedîtina wan riyan jî bû sedem ku zêdetir girîngî bi Seholanê bê dayîn.

Sala 1996’an ew deriyên kevirîn hatin dîtin û di sala 1999’an de jî şaredariya Mehabadê biryar da hemû deriyan ji bo serdana torîst û serdankeran bikar bîne.

Li gora ku saziya çandî ya şaredariya wî bajarî dibêje, her sal herî kêm 200 hezar torîst serdana şikeftê dikin.Lê pirsgirêka Seholanê, ne tenê ev e ku tê piştguhxistin, lê belê ji ber ku rêjîmê hin kelûpel bi simîta pêşesaziyê li wir çê kirine, hinek ji kaniyên wê şikeftê jî ziha bûne.

Şikefta Seholanê gelek dişubhe şikefta Elîsedr li Hemedanê. Cudahiyeke herî berçav di navbera wan du şikeftan de heye ew jî ev e ku qendîk angu kevirên bûzê tevahiya derdora dîwaran û banê şikeftê di nav de nixumandiye. Ger pêçandina şikeftê bi bûzê nebûya, nava şikeftê ewqasî sar nedibû. Lê ev di demekê de ye ku heya niha tevahiya cihên şikefta Seholanê nehatine dîtin.

Piştî ku mirov derbasî nav şikeftê dibe û riyeke kin bi piyan derbas dike, piştre bi beleman dikare di ser avê re derbasî nav riyên cuda yên şikeftê bibe. Ji wan keviran, mînakên ku dişubhin ajalan çê bûne.

Piyê fîl, bûka deryayê û kevokên xweşik ji wan keviran xuya ne. Weke ku mirov wan keviran bi destên xwe çê bike, bedewî têde reng vedide. Di dîwarên şikeftê de ji xeynî nexş û nîgarên ajalan, hin nexş û nîgarên efsaneyî jî hene.



Kevokên taybet û perçemk angu şevşevok, take rûniştvanên şikeftê ne. Ew nolê mişkan in, lê perên wan hene û dikanin bifirin. Dema mirov bi beleman derbas dibe, ronahiya derdorê nahêle perçemk li wir bimînin ji ber ku ew ji ronahiyê hez nakin û berên xwevdidin dalanên tarîtir.

Ew di dalanan de ki ser hêkên xwe dirûnin. Lê kevokên xweşik jî di şikeftê de hene ku berdewam tên û diçin.Riya dervey şikeftê jî, ji bandora ênêrjiya nava şikeftê bêpar nemaye. Li gora yasayên Niyoton û fîzîkê, otombêl divê bi dijwarî bikarîn herin ser çiya. Lê li Seholanê ne fîzîk naskirî ye ne jî Niyoton.

Ji ber ku otombêl bi hêsanî serdikeve û bi dijwarî vedigere quntara çiya. Çiya jî dikeve ser riya Burhanê ku weke navçeyeke xwediya xwezayek xweşik naskirî ye.

Çalakvan dibêjin eger rêjîm girîngiyê bide vê şikeftê û baş li ser dahata wê plan bike ku ji torîstan tê standin bê guman wê bajarên Mehabd û Bokanê jî avedaniyê bi xwe ve bibînin. Lê belê li wir, ji ber diziyê, ti berpirsekî rêjîmê haya wî/wê ji Seholanê nîn e.
Ev çend sal in ku saziya Jîngeyê ya dewletê li parêzgeha Ormiyê biryara parastina navçeyê daye.

Lê li gor pêwîstiyê girîngî ji bo wir nehatiye dayîn. Bûdce jî ji aliyê wezareta navxwe ve radestî qayinqametiya Mehabadê û saziya Jînge hatiye kirin lê ji ber sedemên nediyar ji bo vî karî nehatiye xerckirin.

Tevî vê çalakvanên Mehabadî dibêjin diviyabû pereyên ku ji torîstan têne standin, ji bo avedankirina navçeyê û pişxistinê bihata xerckirin.

Lê ew jî xuya nîn e diçe kuderê!

# Serdar Êywez xan, Kurdê Celalî



N: Rojan Kurmanc

Serdar Êywez lawê Şapûr xan û Xêyr nisa, ji Fîrozê bû ku li sinûrê Xorasana Îran û Turkmenistanê dijîn .

Li sala 1260`an rojî de serdema paşahî Nasiredîn şahê Qacar dema hukmdarîya Emîr Husêyn Îlxan Zeferanlo Şoca dole Qûçanî û Yarmemed xan Şadlo ,seham dole Bijnûrdî girêbesteke şermsar bi navê Axal hate nivîsîn ku bajarê Fîrozê gundên derdor û berê ku erd û axa Îran û war û mekanê Kurdan bû radestî Rûsan hate kirin.

Ji derbarê paşayê Îran Qacar nameyek hat ku nivîsî bû gerêke Kurd ji Fîrozê malên xwe bar kin herin Serhedê Şîrvanê .

Lê Serdar Êywez li vî hukmî re ser danenî û bi gelek keç û lawê egît û gernas raperîn û serhildan kirin û gotin :
Em ji Fîrozê der nakev in. Em heta dawî disekin û berxwedan bikin, Bijî berxwdan, Bijî welat.

Soz û pêyman girêdan û der neketin .

20 salan partîzanî şer kirin sînûrên welêt û axa xwe parastin .

li şerê yekem leşkera Rûs, bi serokîya konstatîn Hafmen hatin ku bajarê Fîrozê dagir bikin, lê Kurdan li bilindîya çîyayê Marko ber xwedan û barût, rijandin şehîd dan û pir ji Rûs koştin û pîroz bûn.

Du salan piştre li şerê duyem de ,serokê Rûsan Mîxayîl Oskoylof bi 2000 şerkeran li çîyayê Gug Repê êrîşî Kurdan kirin û Serdar Êywez ku 30 sal temen hebû, dîsa dijmen êşkand û bi ser ket.

Welat parêzî û şer kirina Kurdan li cîhanê nav û dengê bi rê xist.

Rûsan ku pir kuştî dabûn nameyek ji paşayê Îranê Nasiredîn şah re şandin û ji wan alîkarî xwestin da ku Kurdan teslîm bikin.


Kurdan bi serokatiya Serdar Êywez 12 salan çirîkî û partîzanî şer kirin barût fişengên wan tewav bûn.

Dewleta Qacar jî pişta Kurdan negirt.

Li dawîya sala 1275 rojî de li şerê sisîyan leşkerên Rûs bi piştgirtîya leşkerên Qacar navbera Fîrozê û Gulîl seranî dor li Kurdan gitin û Serdar Êywez û jin û zarok û kal û pîr kû bê pişt û penah mabûn şehîd kirin.

Ûrisan termê Serdar Êywez hilanîn birin Fîrozê kaxa padşaha Tirkemanan tenê û xerîb ispartine xakê û hinek ji Kurdan jî xwe gîyandin




kellê Seranî rizgar bûn.

Ji piştî şehîdkirina Serdar Êywez û xelkê Fîrozê 5 kes ji hevalên wî yên partîzan bi navên serdar Tofe Gul Aras, Hesen Kurdo, Bêygo û Îsaxan Kurd celalî zêdetir ji 6 salan li çiyayên serdar seranî , temel, şivan jîyan kirin û berxwedan ,wan şer kirin û gelek Ûris kuştin û carek din çirîkî êrîşî Fîrozê kirin û bajar ji destê Rûsan derxistin û azad kirin, lê ji ber tinebûna piştvanîyê neçar man dîsa paşve vekişin çîyayan.

Li dawiyê serdar Aras û Îsaxan şehîd dibin Tofe gul hevjîna serdar Êywezê şêr kurd Kurmanc êxsîr bû û ew dûrxistin bo Sîbrîyê.

Hesen Kurdo û Bêygo wan û şerwanên wan êxsîr bûn û li bingehên leşkerî yên Rûsan li Eşq Abad gule baran dikin.

Niha helbest û meqama serdar Êywez xan Kurdê celalî sitranekê rêzdar û bi nirx a Kurdê welat parêz e.

**Eger quntarên berbiroj hakana**

**kesk û sur in**

**Eger çîya hakana ser li jor in**

**Eger demane tijî merx û dar e**

**Oleng tijî binav û çîmezare**

**Bike çirrê li guçikê zemanê**

**Ji xwînê me vira hatîye gîyanê**

**Me xwîn da ta çîya we pê bimînin**

**Serçe li sîngê kemeran bixwînin**

**Çol û kemer we xwînê me hena bûn**

**Gulla qaqe ji nav xwînê me rabûn**

**Tengiz ji hestîyê me ser hilanî**

**Rûbar ji rohndikê me av hilanî**

**Kanî ji bêhna me herkîn**

**Qîrînên me hêz da esiman**

# Konferansek “Kurdên Qefqasyayê û Perspêktîfên Neteweyî”

Di 15-16ê Tebaxa 2024an de, li paytexta Gurcistanê, li bajarê Tibîlîsê, bi pêşengiya komele û zanyarên Kurd, Konferansa Navneteweyî ya “Kurdên Qefqasyayê û Perspêktîfên Neteweyî” hat lidarxistin.




Konferensa Kurdên Qefqasya gelek dewlemen û giringiya xwe hebû ku mijarên elaqedar bi nasnameya netewa Kurd û pirskrêk xistne ber bas.

Mîvanên Konferansê ev bûn.

**1**.Hejarê Şamil - Serokê Enstîtuya Kurdî ya Qefqasyayê.

**2**.Zaza Kalaşov - Serokê Komeleya Kurdên Gurcistanê ‘Ronahî’.
**3**.Îbrahîmê Filît - Berpirsê Weqfa Pêşvebirina Çanda Kurdî (Qazaxistsan)
**4**. Faisa Younes - Seroka Encûmena Hemahengîyê.

Herwisa kesayetiyên naskirî û komek rojnamevan û gelek akadimîsyen Beşdarên Konferansê bûn ku hin ji wan evin.

**1**. Aslîka Qdir, Hunermend,

**2**. Ayten Kotîkyan, Kurdên / Êzdiyên Ermenistanê. Ji zangeha Hewlêrê beşa lînsansa bilind.

**3**. Bahar Alî - berpirsa Emma Organizationê. Hewlêr.

**4**.Îbrahîm Gurbuz - Serokê weqfa Beşikçî

**5**. Kemal Rauf - Silêmanî. Ji Koma nivîskar û rojnamevanên serbixwe.



**6**. Doç. Dr, Resul Geyik, mamoste li zanîngeha Artukluyê.

**7**. Hîwa Massîh Mamoste, zanyarê siyasî û çalakvanê kulturî, Ji Xoresanê.

**8**. Bella Stûrkî - berpirsa radyo “Ronkayî” (Gurcistan)

**9**. Sosyolog Dr.Yaşar Abdusselamoglu, mamoste li zanîngeha Sofya.

**Amadekar. Hacî Kardoxî**

Konferansa navneteweyî ya “Kurdên Qefqasyayê û perspêktîfên neteweyî” bi îfadekirina îradeya beşdaran, bi hewildana baştirkirina hevahengiya komeleyên Kurdan ji bo parastin û pêşxistina nasnameya Kurdî; herweha li ser esasê babetên herî girîng ên ku di konferansê de hatine nîqaşkirin û bi têgihîştina ku pêwîstî bi tevgereke lezgîn a bi biryardarî heye, tezên sereke bi daxuyaniyeke hevpar radigihîne.

• Nasnameya netewî ya Kurdên li derveyî Kurdistanê ji ber gelek sedemên sûbjektîf û objektîf di bin xetera windabûnê de ye. Em bang li hemû rêxistinên Kurdistanî yên li cîhanê dikin ku ji bo rizgarkirin û pêşxistina nasnameya Kurdî li welatên xwe yên fealiyetê bernameyan saz bikin.

• Em bang li rêxistinên Kurdî dikin ku bibin alîkar ji bo avakirina komîsyoneke zanistî ku dê bernameyeke yekgirtî amade bike ji bo hînkirina Zimanê Kurdî ji bo Kurdên li derveyî welêt; herweha bibin alîkar ji bo damezrandina komeke navneteweyî ya zanyaran, ku erkê wan dê bibe amadekirina pirtûkeke yekgirtî ya dersa zimanê kurdî û di paşerojê de jî alfabeyeke yekgirtî.

• Hemû beşdarên ku ev deklerasyon îmze kirine, erka parastina mafên Kurdan, bêyî cudatiya dînî, civakî û medenî, digirin ser xwe. Em pabendbûna xwe bi mafên mirovan û bi taybetî mafên jinan di civakê de û di nav malbatê de radigihînin û bang li rêxistinên Kurdistanî yên cîhanê dikin ku mafên jinan ji tundiyê biparêzin.

• Em bang li Kurdên Başûrê Qefqasya, Ewropa, Asyaya Navîn û hemû cîhanê dikin ku yekîtiya Neteweya Kurdî ya li ser bingehê zimanê Kurdî pêş bixin, ku xîmê parastina nasnameya Kurdî ya bi hezar salan e. Dapîr û bapîrên me wek jêdera netewe û reha çanda Kurdî, ne tenê rabirdûya me ne, ew bingeha dahatûya me ne jî. Loma em bang li her Kurdekî li Qefqasya, Asyaya Navîn û Ewropayê dikin, ji bo parastina nasnameya xwe, paşnavên dîrokî vegerînin, eger ku ew di dema koçberî, zordestî an rewşên din ên neçariyê de winda bûne, an bi zorê hatine guhertin.

• Parastina ziman, û çand herweha dijberiya asîmîlasyonê; bingeheke sereke ye ji bo parastin û pêşxistina nasnameya neteweya Kurd li derveyî Kurdistanê.

Deklerasyon bingeheke ji bo dariştina proje û damezrandina rêxistinên civakî, ku armancên wan dê pêkanîna tez û pêşniyarên li jor be.

Deklerasyon ji aliyê beşdarên Konferansa Navneteweyî ya Tibîlîsê ya “Kurdên Qefqasyayê û Perspektîfên Neteweyî” ve hat qebûlkirin.

**16 Tebax 2024**
**Tibîlîsî, Georgia**

# Jinên xelat vergirtî



**N. Vênûs Fayq**
**W. Hesen Mukerem**

Bi dîtina we tenê bêbaweriya Navenda Wêjeya Cîhanî, bi taybetî komîteyên nirxandina xelatên wêjeyî, bi asta bilind a berhemên wêjeyî yên jinan e ku hêj beşdarbûn û xelatên jinan gelek kêm in?

Xelata Navnetewî ya Booker, ku bi piranî ji romannivîsên mêr re hatiye dayîn, îsal cara yekem jinek bi navê Jitanjali Shri ku xelka Hindustanê ye, bi romana xwe ya Dew Grave ku bi zimanê Îngilîzî hatiye wergerandin, wergirt.

Û ev jî wek du caran destkevt tê hesbandin yekem car wek jin û duyem car wek Hindiyekê beşdarî vê kiriye.

Selman Ruşdî jî wek Brîtanî du caran xelat wergirtiye û romanên wî nehatine wergerandin.




Tevî xelatê, çîroka romanê bû sedema nîqaşan û bû sedema betalkirina merasîma îmzekirinê li Hindistanê bi hinceta ku roman heqaret li hestên Hindûyan kiriye.

Lê mijar ne ev e. Ew li ser xelatê ye, ku bi hemî pîvanan destkeftiyek e ji wê re.

Romannivîsê Cezayîrî Wassini al-Araaji, xwediyê Xelata Qeterê bi romana xwe ya bi navê Padîşahiya Perperokan, dibêje:

Tiştê ku min motîve dike ku ez binivîsim ne xewna bidestxistina xelatekê ye, lê tiştek kûr di hundurê min de ye ku divê ez ji nû ve binivîsim.

Gelek kes hene ku xelatan distînin û paşê wek nivîskar dimirin, ji ber ku dema xelatan werdigirin ji bo wan dibe tiştekî ne asayî."

Ji aliyekî ve ez hêvî dikim ku nivîsandina romanekê ji girêbestekê li ser xelateke ku bextewariya wê piştî kêliya xelatdayînê biqede, pir mezintir e, lê di mijara Jitanjali Shri de, ez aliyekî din dibînim.

rewşek e ku jin bi pîrozkirina partiyê û piştevaniya mêran were pêşve xistin, ku berpirsiyarî rola xwe bilîze, û partî û medyayên partiyan kontrol bikin.

Belê, mijara asta nivîsê û nirxa wêjeyî ya şaheserê ye, ku pêwîstî bi komîteyeke pispor û bêalî heye. Bi rastî, li welatekî ku komîteyên festîval û xelatan an jî rojnamevanên ku kar nexwendin û ji paş ve tênê rêve kirin, tênê xelat kirin.

**Aliyekî van xelatan nayê înkarkirin, ji ber ku romannivîsekî kurd wek Yaşar Kemal gelek xelatên navneteweyî wergirtiye, çend caran ji bo xelata Nobelê hatiye berbijêrkirin û carekê jî ketiye lîsteya dawî û bûye yek ji çar romannivîsên ku Dibe şahiya van hemûyan ji bo Yeşar Kemal tenê rojekê dom kiribe.**



Îsal pênc romannivîsên jin ji çend welatan bo yekem car hatibûn berbijêrê xelatê, ligel tenê romannivîsekî mêrê Norwêjî hatibûn kirin.

Ev bi serê xwe gaveke nû ye ji bo xelatê ji bo vegerandina baweriya bi jinên afirîner di wêjeyê de.

Di dawiyê de, beşdarbûna di xelateke cîhanî ya weha de ne

An jî weşanxane jî, yek ji van nikare xebatek dûrî prensîb û pîvanên nûjeniyê binirxîne, lê xwendevanê asayî yê rastîn e ku heqê kirîna pirtûkê dide, ew xelata ku divê di dawiyê de nivîskar girêbestê li ser bike.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Rêjîma Îranê zarokek li bajarê Mihabadê de binçav kirin



Hêzên îtilaata rêjîmê li bajarê Mihabadê de zarokekî temen 16 salî binçav kirin û bo ciheke nexuya veguhastin. Pêka raporan ew birayê şehd Zanyar Ebûbekrî, yek ji şehîdên şoreşa Jînayê ye.

Sibêdeha roja Sêşemî 13ê Xermananê, zarokekî temen 16 salî yê bi navê Ramyar Ebûbekrî ku birayê şehîd Zanyar Ebûbekrî şehîdê şoreşa Jînayê yê, ji aliyê hêzên îtiêlaata rêjîmê li bajarê Mihabadê de hate binçavkirin û bo ciheke nexuya hate veguhastin.

Pêka raporên belavbûyî, hêzên îtilaata rêjîmê bê hebûna ti belgeyeke yasayî li demjimêr 3ê sibêdeha roja Sêşemiyê de êrîşkirine ser malbata Ebûbekrî û tevî binçavkirina Ramyar Ebûbekrî, bav û dayîka wî bi awayekî hovane kutane.

Heta belavbûna vê nûçeyê, ti zanyariyek li derheq sedema binçavkirin, tohmetên sepandî û cihê ragirtina wî zarokê 16 salî, li ber dest nîne.

Zanyar Ebûbekî li 5ê Xezelêwera 1401 bi teqeya hêzên çekdare rêjîmê û bi gulleyê qenaseyê li temenê 22 saliyê de li bajarê Mihabadê hate şehîdkirin.

## Dadgeha olî ya rêjîmê sizaya 15 heyv girtîgeh bi ser mamostayekî olî de sepand



Dadgeha olî ya rêjîmê anku dadigeha taybet bi rûhaniyetê li bajarê Hemedanê, sizaya 15 heyv girtîgeh bi ser mamosta "Sabir Xudamuradî" yê pêşnivêjî bajarê Seqizê de sepand.

Roja Pêncşemî 8ê Xermananê, dadgeha olî ya rêjîmê li bajarê Hemedanê, bi tohmeta "teblîxat li dijî rêjîmê" 15 heyv girtîgeh bi ser mamosta "Sabir Xudamuradî" yê pêşnimêjê şehreka "Qewex" a bajarê Seqizê de sepand.

Pêştir jî li heyva Banemera 1402 a Rojî de vê dadgeha rêjîmê bi sedema vê yekê ku mamosta "Sabir Xudamuradî" piştevanî li tevgera "Jin Jiyan Azadî"yê kiribû û teperserî û reftara hovane ya hêzên rêjîmê bi dijî xelkê xwenîşandere vê tevgerê bi tundî şermezar kiribû,sizaya 72 derbên çamçiyan û 7 heyv girtîgeh bi ser wî mamostayî de sepandibû, niha ji nû ve dîsan dadigeha taybet bi rûhaniyan a rêjîmê 15 heyv girtîgeh bi ser wî mamostayî de sepandiye.

## Rêjîma Îranê kolberek li sînorê bajarê Banê de kuştin



Hêzên hov ên întizamiye rêjîma Îranê li sînorê bajarê Banê de kolberekî temen 24 salî kuştin.
Pêka rapora Kurdpayê, roja Înê 9ê Xermananê, kolberekî temen 24 salî bi navê "Es`ed Ispendar" ê xelkê gundê "Qule Swêro"yê ser bi bajarê Serdeştê, li encama teqeya rasterast a hêzên întizamiye rêjîma Îranê li sînorê "Alot"ê ser bi bajarê Banê de kuştin.

Pêka rapora Kurdpayê, hêzên întizamî yên rêjîma îslamiya Îranê, bê agehdarkirna berê teqe li wî kolberî kirine û gulleyên wan hêzên çekdar bi zik û navtenga wî kolberî kevtine.

Termê wî kolberî, li gundê wî yê bi navê "Qule Swêro"yê ser bi bajarê Serdeştê, bi axê hatiye spartin.

# Agirî

◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE    E - Mail: Agiri2003@gmail.com    Hejmar (477)